Kurmanji Roman - Parastinî Nivîsarên Pîroz - Protection Scriptures

Hezekiyêl 3:18 - Aqûb 5:19,20 Birayên min, eger yek ji we ji rastiyê averê* bibe û yekî din careke din wî li rastiyê bizivirîne, 20 bila bizane, yê ku gunehkar ji riya wî ya averê bizivirîne, wê canekî ji mirinê xilas bike û gelek gunehan binixumîne.

Romayî 12:21 Bila xerabî te bindest neke; lê belê tu bi qenciyê xerabiyê bindest bike.

Zebûr 143:8,10 Serê sibê, kerema xwe bi min bide bihîstin, Çimkî ez bi te bawer im; Riya ku ezê herim nîşanî min bide, Çimkî ez canê xwe ji te re bilind dikim. 10 Min hîn bike, da ku ez daxwaza te bînim cih, Çimkî tu Xwedayê min î. Bila ruhê te yê qenc, Di rê de rêberiya min bike!

Zebûr 94:12 Çi dilgeş e ya Xudan, yê ku te perwerde kirî, Û yê ku te şerîeta xwe pê hînkirî!

Gotinên Silêman 27:12 - 1 Korîntî I. 10:13 Hûn ji tiştên mirovî pê ve neketin tu ceribandinên din. Xwedê dilsoz e û destûrê nade ku hûn ji karîna xwe zêdetir bên ceribandin. Lê belê ji bo ku hûn bikarin ragirin*, ewê bi ceribandinê re riya jêderketinê jî pêk bîne.

Filîpî 2:16 û peyva jiyanê hişk bigirin. Wusa ku, di Roja Mesîh de ji min re bibe pesin, da ku ez badîhewa nebezîbim û min badîhewa keda xwe nedabe.

Îşaya 49:4 - Galatî 4:11Ez ji we ditirsim ku xebata min a ji bo we badîhewa here.

Zebûr 76:3 Wî li wê derê, tîrên bi agir, Şûr û mertal, çekên şer şikand.

Îbranî 13:21 bila we bi her tiştên qenc rapêçe, da ku hûn daxwaza wî bînin cih û bila bi rêberiya Îsa Mesîh tiştê ku li wî xweş tê bi me bide kirin. Rûmet her û her ji wî re be. Amîn.

1 Korîntî I. 16:15/16 Birano, daxwazeke min ji we heye; hûn dizanin, maliyên Stefanas, bawermendên pêşî yên herêma Axayayê ne. Bi ser de wan xwe ji xizmeta pîrozan re veqetandiye. Serî li ber yên weha û li ber hemûyên ku bi wan re dixebitin û keda xwe didin, deynin.

Filîpî 1:27 Lê bila jiyana we hêjayî Mizgîniya Mesîh be, da ku ez bêm we bibînim, an neyêm jî, ez bibihîzim ku hûn di ruhekî de hîmgirtî ne û bi dil û can bi hev re ji bo baweriya* Mizgîniyê tekoşînê* dikin

1 Korîntî I. 15:58 Ji bo vê yekê, ey birayên min ên hezkirî, veneleqin,

nelebte bin, di karê Xudan de herdem xîretkêş bin; çimkî hûn dizanin ku bi Xudan re keda we ne badîhewa ye.

Kolosî 4:12 Êpafrasê ku yek ji we ye û xulamê Mesîh Îsa ye, silavan li we dike. Ji bo ku hûn di her daxwaza Xwedê de bêkêmahî û tam bi piştrastî bisekinin, ew hergav bi xîretkêşî ji bo we dua dike.

Yêremya 15:20,21 - Zebûr 37:40 Xudan ji wan re dibe alîkar, rizgariya wan tîne, Ji destê xeraban xelas dike, azadiya wan tîne, Çimkî wan xwe li wî spartine.

Zebûr 55:18 Wî ez ji şerê li hember min, Bi aştî xelas kir canê min, Çimkî zêde bûn, yên ku şer dikirin bi min.

Hezekiyêl 30:24 - Lûqa 1:51 Wî bi zendê xwe qudreta xwe nîşan da, Û wî, yên di dilê xwe de pozbilind ji hev belav kirin.

Peyxama Yûhenna 3:18 Şîreta min li te ev e: Zêrê ku bi êgir hatiye safîkirin ji min bikirre, da ku tu dewlemend bibî; cilên spî ji min bikire, da ku tu li xwe bikî û şerma tazîbûna te bê nixumandin. Û dermanê çavan ji min bikire û li çavên xwe bide, da ku tu bibînî.

1 Yûhenna 3:17 Eger malê dinyayê bi kesekî re hebe û birayê xwe di rewşeke hewcedar de bibîne û dilê wî pê neşewite, çawa hezkirina Xwedê di dilê wî de dimîne?

Îşaya 50:4 - Lûqa 21:15 Çimkî ezê dev û ziman û şehrezayiyê bidim we, ku neyarên we nekarin li ber we bipeyivin an bisekinin.

Efesî 6:10-14 Bi kurtî, bi Xudan û bi qeweta karîna wî bi hêz bibin. 11 Ji bo ku hûn bikarin li hember hîleyên Îblîs rawestin, hemû çekên Xwedê li xwe bikin. 12 Çimkî cenga me ne li hember xwîn û goşt e, lê belê li hember serweriyan, li hember desthilatiyan, li hember hukumdarên gerdûnê yên vê taristaniyê, li hember ordiyên ruhî yên xerabiyê yên li cihên ezmanî ye. 13 Ji ber vê yekê hemû çekên Xwedê bistînin, da ku hûn bikarin di roja xerab de li ber xwe bidin û piştî ku we her tişt kir, li cihê xwe rawestin. 14 Îcar, pişta xwe bi rastiyê bipêçin û zirxê rastdariyê li xwe bikin

Zebûr 18:39 Ji bo şer te ez bi hêzê rapêçandim, Yên ku li hember min rabûn di bin min de pelişandin.

2 Samûêl II. 22:40 - Kolosî 1:11 Wusa ku hûn li gor hemû hêza wî ya ku ji karîna wî ya bi rûmet tê, xurt bibin, her tiştî bi bîhnfirehî ragirin* û bi şahî

Hezekiyêl 13:6 - Marqos 13:22 Çimkî mesîhên derewîn û pêxemberên derewîn wê derkevin. Wê nîşan û karên mezin çêkin, wusa ku eger bibe, ewê bijartiyan jî bixapînin.

Zebûr 89:43 Te devê şûrê wî jî, werrivand, Û kir ku ew di şer de bişikê.

1 Korîntî I. 14:8 Eger borî jî dengekî nekifş derîne, kî wê xwe ji bo şer amade bike?

Lûqa 10:19 Va ye, min desthilatî daye we, ku hûn pê li mar û dûpişkan û hemû hêza dijmin bikin û tu tişt qet ziyanê nade we.

2 Korîntî II. 7:10 Çimkî xemgîniya li gor Xwedê, tobeya ku dibe xilasbûnê pêk tîne û poşmanî tê de tune. Lê heçî xemgîniya dinyayê ye, ew mirinê pêk tîne.

2 Tîmotêyos II. 2:25,26 Divê ew bi nermî şîretan li yên dijraber bike, belkî Xwedê fersendê bide wan ku tobe bikin û rastiyê bizanin 26 û bi ser hişê xwe ve bên, wusa ku ji xefika Îblîsê ku ji bo daxwaza xwe ew girtine, xilas bibin.

Nehemia 4:15 - Karên Şandiyan 5:38 Îcar, ez ji we re dibêjim: Dev ji van mirovan berdin û wan bihêlin bi serê xwe. Çimkî eger ev niyet û kar ji mirovan be, wê xera bibe,

Zebûr 73:24 Bi şîreta xwe rê nîşanî min didî, Dû re min digihînî berziya xwe.

Yêremya 1:18 - weke bajarê defenced, û lewheyê ji hesin û dîwarên tûncê li dijî xerab - as a defenced city, and an iron pillar, and brasen walls against evil

Yêremya 6:27 - wek birc û birceke - as a tower & fortress

Qanûna Kahîntiyê 26:19 - Xwedê bişkînin k'öbarîyê ji hêza te; û ezmên, wek hesin, û erd jî wek tûncê: - God break the pride of your power; & make heaven as iron, & earth as brass:

Qanûna Kahîntiyê 26:37 - tu hêza me tune xwe rawestin di şer de - no power to stand in battle

Dubarekirina Şerîetê - Dubarekirin Qanûnê 23:5 Xwedê nifir venegerin cem bereket - God turn curse into blessing

2 Padîşah II. 19:34 Xwedê diparêzin - God defend

Eyûb 15:24 amade ji bo şer - ready to battle

1 Dîrok I. 12:8 bihorîn ji bo şer - fit for battle

1 Dîrok I. 12:33,38 Pisporê di şer de, biparêze ranga di şer de - expert in war, keep rank in battle

Pastor T. John Franklin
Church of Salvation, Healing, and Deliverance
COS-HAD.org